

# NE'MA PAWLOS FILÎMONR'A

## Pêşgotin

Filîmonê bawermend yekî e'yan bû, ew dostê Pawlos bû, xuya dibe ku endemê civîna<sup>f</sup> Kolosyayê bû. Xulamekî wî jî hebû navê wî Onîsîmo, ew jî cem xweyê xwe r'evîbû û gerekê bona kirê xwe bihata kuştinê. Lê gava Pawlos kelêda bû, xuya dibe ku Onîsîmo wî dibîne, t'obe<sup>f</sup> dike, dibe bawermendê Îsa. Bi vê ne'mê Pawlos hîvî ji Filîmon dike, ku ew bibaxşîne Onîsîmo û wî qebûl ke, ne t'enê usa çawa meriv<sup>f</sup> dibaxşîne xulamêd xwe, lê usa bibaxşîne çawa yek dibaxşîne birakî xweyî bawermend.

Vê ne'ma kinda derseke k'ûr bona wê bawerî<sup>f</sup> û h'izkirina Mesîh k'ifş dibe, ku çawa gerekê nava bawermendada hindava hevda hebe.

### Serecema fikira ne'mê

Pêşgotin (1-3)

Pesinê Filîmon dide (4-7)

Hîvîkirin bona Onîsîmo (8-22)

Paşgotin (23-25)

### Silavkirin

**1** <sup>1</sup>Ji Pawlos, bona Mesîh Îsa girtî û Tîmot'êyoyê bira,

Filîmonê heval-xebat û delalê xwer'a, <sup>2</sup>Afiya xûşkr'a û Arxîpoyê hevalskerê xwer'a û usa jî wê civînêr'a<sup>f</sup> ku mala teda dicive\*:

<sup>3</sup>De bira k'erem<sup>f</sup> û e'dilayîya Xwedêyê Bavê<sup>f</sup> me û Xudan<sup>f</sup> Îsa Mesîh li we be.

### Bawerî<sup>f</sup> û h'izkirina Filîmon

<sup>4</sup>Ez her gav ji Xwedêyê xwe r'azî me, gava nava duayêd xweda te bîr tînim birayê Filîmon, <sup>5</sup>çimkî

---

\* 1:2 Kolosî 4:17.

bona wê h'izkirina teye hindava t'emamîya cime'ta Xwedêda û bawerîya teye hindava Xudan Îsada dibihêm. <sup>6</sup> Ez dua dikim, wekî heleqetîya teye t'evî me, nava bawerîyêda<sup>f</sup> me bigihîne wê zanebûna k'ûr, ya ku hindava her tiştêd meye qence t'evî Mesîh e. <sup>7</sup> Bona wê h'izkirina dilê teda birayo, ez gelekî şa bûm û bîna min fire bû, ku dilê cime'ta Xwedê pê te r'ih'et bûye.

**Hîvîkirina Pawlos bona Onîsîmoyê xulamê Filîmon**

<sup>8</sup> Bona vê yekê bi Mesîh çawa bira, min dikaribû turuş kira, e'mirî ser te bikira, çi ku cayîz bû, <sup>9</sup> lê ji dest h'izkirinê, hîvî dikim. Ez çawa Pawlosekî kal û niha jî bona Mesîh Îsa girtî, <sup>10</sup> bona lawê xwe Onîsîmo hîvî ji te dikim, yê ku qeydê minda çawa kur'ek minr'a dinê k'et\*. <sup>11</sup> Ew wextekê kêrî te nedihat, lê niha hin kêrî te tê, hin jî kêrî min\*.

<sup>12</sup> Ez wî paşda dişînime cem te, ew cegera min e. <sup>13</sup> Min dixwest ew cem xwe bihişt, ku dewsa te ber destê min bûya, h'eta ku ez bona Mizgînîyê qeydada me. <sup>14</sup> Lê bêyî

te min nexwest tiştêkî bikim, ku qencîya te usa nebe, çawa borcek kiribine stûyê te, lê bi r'ezedilîya te be. <sup>15</sup> Belkî bona vê yekê ew wextekê ji te dûr k'et, ku ew her t'im bibe p'ara te, <sup>16</sup> ne ku çawa xulam, lê ji xulamekî zêdetir e, çawa birakî delal! Bona min ew çiqasî delal e, lê bona te ewê hê zêde be, hin aliyê xulamtiyêda, hin jî aliyê Xudanda.

<sup>17</sup> Awa heger tu min çawa hevalê xwe h'esab dikî, wî usa qebûl ke, çawa min. <sup>18</sup> Heger ewî neheqîk jî li te kiribe, yan tiştêkî deyndarê te be, ser min h'esab ke. <sup>19</sup> Ez Pawlos bi destê xwe dinivîsim: Ezê li te veger'înim (lê ez bi vê yekê naxwazim bêjime te, ku tu jîyîna xweva deyndarê min î.) <sup>20</sup> Niha, birayê minî ji Xudanda, vê qencîyê bona min bike, bona xatirê Mesîh dilê min r'ih'et ke. <sup>21</sup> Ez guhdarîya teda guman bûm, lema jî min ev yek ter'a nivîsî, çimkî ez zanim tê ji gotina min zêdetir bikî.

**Gotinêd axirîyê**

<sup>22</sup> Pêştirî vê yekê jî, minr'a cîkî mayînê hazir ke, çimkî gumana

\* <sup>1:10</sup> Kolosî 4:9.

\* <sup>1:11</sup> «Onîsîmo» bi zimanê yûnanî tê fe'mkirinê: «Kêrhatî».

## FILÎMON, 1

---

min heye, ku Xwedêyê caba dua-  
yêd we bide, min paşda bide we.

<sup>23</sup> Êpafrasê bona navê Mesîh  
Îsayî t'evî min girtî, te silav dike,

<sup>24</sup>usa jî Marqos, Erîstarxo, Dîmas  
û Lûqa, heval-xebatêd min.

<sup>25</sup>K'erema Xudan Îsa Mesîh  
t'evî r'uh'êd we be.